*Kemal Reşîd Elî*

## (1)

Navê te hêvênê hozanane
Hevîrtirşê jiyana me hemûyane
Kursîka te,
Tevafa mêrxas û Egîdane.
Peyîva te
Ji ya ser mir e hebûnê pîroztire
Girnijîna te bo penya
Ji Behişta Xudê şirintir e.
Pêşewaziya te bo Qirala,
Ji singe dayîkê germtir e
Û bo êkê weku min
Ji çilê zivistanê sartir e…

## (2)

Rîzdar û hêjayî bo wî bin
Yê bejin û bala siltana
Diqîrîn e…
Saman û leşkerên xûdawenda
Di benda axê de dirizîne…
Qiralên çak
Zavaniya we dixemlînin,
Hizareha Horiya dikite
Eşqek û tê diwerînît…

## (3)

Ew çiyayê di eşqa te de,
Kizgiryokê negîrît
Derûnê min tê de aram nabît…
Ew ji mir e nîşana te pêvenebît
Ew dostê îmza te di dûv re nebît…
Ewê bo êkê dî xwe bakujît
Rojeka bi tinê jî najît…

## (4)

Fîrewnî xwe kire hukumdar!
Hevsar di stokê beniya de
Birîne xar.
"Mûsa" î nanê Fîrewnî têrxar,
Lê hizra wî qed venexar…
Fîrewnên evro û duhî û pêr
Vegirtin mizgefit û dêr
Mal û jin, rih û zêr
Bi navê wan têne dan.
Tev xêr û bêr.

## (5)

Rûbar diçît û dikite xar,
Evîna te di dilî de diçîte xar…
Hozan û çîrok…peyker û awaz
Quneteka jînê vedikirin.
Her çiqekê ji dara jînê
Diête pêşkêşkirin
Rojî û nivêjin
Min di eşqa te de dirêjin…